

Beyanata Kombûna Salvegera 25ê ya Xelata Sakharov (Saxarov)î ya ji aliyê Tora Xelata Sakharovî ve tê dayîn



Çeperast, pêşî: Shirin Ebadi (temsîlkarê N. Sotoudeh), Xanana Gusmao, Wei Jinsheng, Taslima Nasreen, EP President Martin Schulz, Malala Yousafzai, former EP President Lord Plumb, Vildana Selimbegovic of Oslobodjenje, Leyla Zana, Salima Ghezali, Fernando Savater of Basta Ya, Dom Zacarias Kamwenho.

Çeperast, paşî: Nurit Peled, Guillermo Farinas, Alexander Milinkievich, Christophe Deloire-ê RSF-ê, Rosa Maria Paya (temsîlkara Oswaldo Paya), Berta Solerê ji Damas de Blanco, Hauwa Ibrahim, Salih Osman, Ahmed El Senussi and Karim Lahidji (temsîlkarê J. Panahi).

20ê Çîrîya Paşîna 2013ê, Strazbûrg

A. Dema ku ev beyanata sazkar a Tora Xelata Sakharovî ya 2008ê hat berbiçavkirin, em ên wergirên Xelata Sakharovî yên li jêrê, bi têgihîştina rola taybeta bûyîna Qasidên Azadîya Ramanan, bi xwedîyên Xelata Sakharovî re û bi navgînîya di binê siwana Parlemana Ewrûpayê de ji bo bizivîna di tevahîya cîhanê bi çalakîyên hevkar ji bo destekdayîna ji parêzerên mafên mirovan re, me biryar daye ku em bizavên xwe yên hevkar bêtir bikin;

B. Dema ku di encamên Konseya Mafên Mirovan û Demokrasîyê yên di 25ê Hezîrana 2012ê de Dewletên Endamên Yekîtiya Ewrûpayê xwe ji bo karkirina bi hevkarên forum û rêxistinên navdewletî yên mafên mirovan û demokrasîyê bexişandine; Konseya Yekîtiya Ewrûpayê ji bo bêtirkirina çetirî û xuyanîya sîyaseta Mafên Mirovan a YE-yê li ser giringîya Nûnertîya Taybet a

YE-yê (EUSR) rawestîyaye û bi hevkarîya nêzîk a Parlemana Ewrûpayê û Komîsyona Ewrûpayê û civata sîvîl re bi dilxwazîya hevkarîyeka rast bexişandina xwe daye der;

C. Dema ku Parlemana Ewrûpayê, di qanûnê pêşniyar ê 13ê Çileyê Pêşînê 2012ê yê stratejîya mafên mirovan a YE-yê de li ser giringîya çêtir bikaranîna potansiyela Tora Xelata Sakharovî ya PE-yê û dema ku delegasyonên PE bi wezîfedarîyê diçin welatên rewşa wan a mafên mirovan biendîşe ye, şîreta vîyana endamên wan ên bi taybetî ji bo eşkerekirina pirsên mafên mirovan li wan kirine û her delegasyoneka parلمانê û vîyana endamêkî bi taybetî wezîfedêr ji bo çavdêrîya portfolyoya mafê mirovan li herêma, welatê an jî cîhê tematîkê endîşe li serê heye û hatiye xuyandî ku kesên bi vî tiştî ve peywendîdar hatine wezîfedarkirin divên raporên bi rêk û pêk bidin Komîteya Jêrîn a Mafê Mirovan a Parlemanê;

HIŞYARÎ, KAMPANYA Û ÇALAKÎYÊN DESTEKÊ

1. Tora Xelata Sakharovî, pirsên mafên mirovan ên ku biserketî karibin li ser wan bi hev re û bi Yekîtiya Ewrûpayê û civatên sîvîl re di tevahîya cîhanê de ji bo feydeya mafên mirovan bixebitin, bi awayê guhdan û sexbirîya li ser rewşa Sîyasî ya Wergirên Xelata Sakharovî dê ji bo xuyandîna tev were gerîn; Endamên Torê, xwe bi serê xwe û bi hev re wek sîstemeka hişyarîya cîhanî ya bînpêkirina mafê mirovan bibexşînin û bi çalakîyên bi serê xwe û hevkar, tevlibûna li çalakîyên mafên mirovan, bangkirinan, pêşkêşkirina beyanatan û dannasîna hebûnên welat û qada wan jî di nav de, helwista wan ji bo girtina qedrê mafê mirovan ên cîhanî be;

2. Endamên Torê, bi hev re an jî bi serê xwe, ji bo kişandina bala navdewletî ser mebest û rewşan, dê parêzerên mafên mirovan bi awayekî sembolîk-remzî bikin wek zarokên me'newî û bi kirina vî awayî li dijî zordarîyê, ji kêfê re avêtina binê nezareta, îşkence, înfazkirina bêmehkemekirinê an jî cezayê kuştinê, alîkarîya wan bikin; Tora Xelata Sakharovî, bi hev re an bi serê xwe bala navdewletî dikişîne ser rewşên van ên zehmet û dema ku mumkin be tevli dozên wan ên mehkemeyê dibe û wan li dijî mehkûmîyeta ji bo kêfê an jî li dijî bersûckirinê diparêze, xwe ji bo parastina Wergirên Xelatê û ji bo yên ji ber çalakîyên mafên mirovan hatine mehkûmkirin û daweyên wan dewam dikin, dibexşîne;

3. Tora Xelata Sakharovî bêrbûna ji cezayan dide pêzanîn û xwe li dijî bizavên bineyartî yên kesan û koman ên wek tengkirina azadiyê û awayên din dibexşîne; Tora Xelata Sakharovî, belênî dike û soz dide ku ew ê li dijî mekanîzmayên serbestmayîna kesên di nava rêxistinên dewletî û li nava avahîya dewletê qirkirinê an jî biryarên YN ên mafên mirovan bînpê dikin û bizavên li dijî mirovahîyê, îşkence, lêdan û avêtina nezaretê ji bo kêfê û bizavên bi wî awayî kar bike; Tor, ji bo demên pişt şerî serbestmayîna ji cezayên ji alîyê mehkemeyan ve hatine dayîn banga endîşeyê li endamên navdewletî dike;

4. Tora Xelata Sakharovî, bi hevkarîya bi rêxistinên civata sîvîl re pîlana ji bo Xwedanên Xelata Sakharovî û parêzerên mafên mirovan ên din û malbatên wan ên di binê xeterê-rîskê de yên li welatên xwe, sazkirina ji bo Parêzerên Mafên Mirovan ên Xelatgirên Sakharovî Cîhekî Xweavêtina Bext, sitargeheka mueqet saz bike; Endamên Torê, xwe ji bo parêzerên mafên mirovan ên ku pêdivêya wan berra bi avêtina bext hebe şîretkarîyê dike an jî xwe ji bo sivikkirina zehmetîyên li ser wan dibexşîne; Endamên Torê, ji bo parêzerên mafên mirovan ên bi mebesta xweavêtina bext dixwazin vîze bistînin, karin nameya destekê binivîsînin;

HEVKARÎ Û BI DEZGEHÊN YE RE PÊKANÎNÊN RAST

5. Wergirên Xelata Sakharovî, danzanîna bi Parlemana Ewrûpayê û bi taybetî Komîteya Têkilîyên Derve (AFET) û Komîteya Jêrîn a Mafên Mirovan (DROI) û cihên nêvekî yên mafên mirovan ên di Delegasyonên YE û welatên pêwendîdar bi awayekî bi lez hişyarkirina ji tiştên nû yên girîng ên bi pirsên mafên mirovan ên pêwendîdar ên di heqê mebesta çalakîyê de ji xwe re dîkin amanc; mirov kare di warê parastina wergirên xelatan û komên sivîl ên li welatên wan ji bo ji wan re dayîna desteka tethîqî, bi dezgehên civata sivîl ên navdewletî jî ewle bibe;

6. Tora Xelata Sakharovî, bi mebesta bipêşvebirina demokratîkbûnê û mafê mirovan dayîna zanyarîyê û danzanîna pirsên mafên mirovan ji mîsyonên çavdêrîya YE ji xwe re dike mebest;

7. Wergirên Xelata Sakharovî, dema ku delegasyonun parlementeran serî li welatên sisêyê dan an jî Wergirên Xelatê serî li Parlemana Ewrûpayê dan, hevdiştina bi wan re û dan û standina bi wan re li ser mafên mirovan ji xwe re dîkin amanc;

8. Tora Xelata Sakharovî, bi navgîniya Servîsa Çalakîyên Derveyên Ewrûpayê û bi taybetî nûnertîyên Welatên Endam bang li YE dike ku ew ji bo parastina parêzerên mafên mirovan û Wergirên Xelata Sakharovî yên di binê rîskê-xeterê de sozekî bikok û dîplomatîk bidin.

9. Tora Xelata Sakharovî di dema rû bi rû mayîna qewimîna bînpêkirina mafên mirovan de ji bo hem ji alîyê hikûmeta bînpêker û hem jî ji alîyê xelqê wê ve qet'îkirina bihîstina peyamê bang li YE dike ku ew dijberîya xwe bi dengê bilind bang bike.

10. Tora Xelata Sakharovî bang li Wezîrên Derve yên YE û hikûmetên wê dike da ku ew li ser mafên mirovan bi tevlihbûna Endamên Tora Sakharovî qayîşkêşîyên-munaqêşeyên eşkere bike; Komîteya Têkilîyên Derve (AFET) û Komîteya Jêrîn a Mafên Mirovan (DROI) dê di nava komîteyên hevkarîyê yên parلمانên neteweyîyên YE de hişyarîya di heqê Tora Xelata Sakharovî de bêtir bikin.

11. Tora Xelata Sakharovî, hêzên bandora Parlemanên Netewayî yên Dewletên Endamên YE hem di asta dualî û hem di asta pîralî de, di çarçoveya pêwendîyên nava parlemanên û forûmên nava parlemanên de bang dike ku ew ji bo parastina mafên mirovan û rûmeta mirovî, tevlihbûna dozê û pêkanîne, mewqîdaşên li welatên xwe wêrek bikin;

12. Tora Xelata Sakharovî ji bo avakirina komîteyeka mûqeta tê de Wergirên Xelata Sakharovî û Endamên Parlemana Ewrûpayê hebin bang dike da ku bi rêxistinên hevkar bi dezgehên YE re welatên di binê xeterê-rîskê de bi welatê navbuhurî an jî qurbanîyên herêmê re, parêzerên mafê mirovan, dezgehên civata sivîl û komên civata sivîl re bidin û bistînin û li mafên mirovan û bînpêkirinên azadîya sivîl bikolin, werin wezîfedarkirin.

HÎNKARÎYA-FÊRKARÎYA LI SER STANDARDÊN MAFÊN MIROVAN Û HAYJÊHEBÛNA CÎHANÎ

13. Endamên Tora Xelata Sakharovî, bi hev re an jî bi serê xwe, bi awayekî eşkere bi rêxistinên mafên mirovan ên navdewletî û komên civata sivîl re li forûmên herêmî û xwecîhî, di medyayê de û forûmên pêwendîdar ên akademîk û kulturî de kampanyayên mafên mirovan li dijî bînpêkirina mafên mirovan diaxifin û ji bo destekdayîne sexbirîyê dîkin û soz didin;

14. Tora Xelata Sakharovî, ji bo li welatê xwe bixwe hayhebûna ji standardên navdewletî yê mafên mirovan û alîkarîya dewlemendkirina jîyana netewayî, dayîna Bûrseka Xelata Sakharovî ji xwe re wek amanc dihesibîne; Endamên Torê, dê tê bikoşin ku di asta cîhanê de salixê namzetan bidin; Endam, soz didin ku dê li gora tecrîbe û pîsporiyên xwe alî bernameya bûrsan bikin; Parlemana Ewropayê; dê ji bo dewlemendkirina zanîna parêzerên mafên mirovan li ser standard û pîrsên wan ên mafên mirovan ên navdewletî pêşkêşkirina derfeta stajê bifikire;

15. Endamên Tora Xelata Sakharovî, bi hev re û bi serê xwe, li ser qedandina şiddeta li ser zarokan û destekdayîna ji bo hînkariya zarokan kampanyayên navdewletî, tevlibûna li kampanya û çalakîyên li ser torê-internetê, beyanên dayî, bi rêya serîlêdanên herêmên zarok li wan di rewşa zehmet de dijîn, ji bo haydarkirina ji mafên zarokan ên cîhanê û herêmî bilindkirina dengê xwe, ji xwe re amanc dihesibînin;

BANG

16. Tora Xelata Sakharovî, bang li meqamên Îranê dike ku ew ji bo Wergirên Xelata Sakharovî, Nasrin Sotoudeh-ya ji ber parêzerîya mehkûmên siyasî hatiye zîndanî kirin û Jafar Panahi-yê ku ji ber bikaranîna azadîya rêxistinê hatiye zîndanî kirin 'efûya giştî derbixe û navê van kesan ji hemû bersûckirinan were pakkirin û astengiyên wan ên geştîyarîyê werin rakirin;

17. Tora Xelata Sakharovî bang li meqamên Çînê dike ku ew kêmkirinên carbicar ên li ser Hu Jia-yî rawestîne û ew karibe azadîya îfadekirinê û rêxistinê bi kar bîne, destûra mafê wî yê geştîyarîya navdewletî were dayînê û zîndanîkirina wî ya li malê ya ji kêfê re were rawestandî, lêxistina wî were astengkirin; Tora Xelata Sakharovî bang li meqamên Çînê dike ku parêzerên mafên mirovan û muxalifên siyasî bi serbestî, bêyî tîrsa cezakirinê destûrê bidin bikaranîna azadîya ramanên xwe û hemû parêzerên mafên mirovan ên di zîndanê de werin azadkirin;

18. Tora Xelata Sakharovî endîşeyên xwe yê li ser gelê Sûrîyeyê û hevkarîya bi wan re dide der, wergirê Xelata Sakharovî Razan Zaîtouneh hêj li Sûrîyeyê di nava şerekî demdirêj î bijan de dijî, bang li meqamên Sûrîyeyê dike ku ew çalakîyên xwe yê 'eskerî yê li ser sivilan rawestîne û qedrê şerefa mirovan bigire û civata navdewletî ji bo alîkarîya însanî û dermanî ya kesên di nava Sûrîyeyê de û li derveyê Sûrîyeyê dijîn, teşwîq dike;

19. Tora Xelata Sakharovî, hemû çalakîyên ku wek bînpêkirina mafên mirovan, azadîya ramanan, îfadekirina ramanan û mafên sivil, û bi taybetî girtin, lêxistin û tixûbkirina mafê birêxistinbûnê tê qebûlkirin ên li ser Wergirên Xelata Sakharovî tawanbar dike. Tor, Wergira Xelata Sakharovî Dama de Blanco Sonia Garro jî di nav de bang dike ku li Kubayê û li hemû deverên cîhanê mehkûmên siyasî û sûckirîyên siyasî werin berdan, û li ser mirina Oswaldo Payá-yê Xwedanê Xelata Sakharovî ya 2002yê were kolîn û pîrsîn;

20. Tora Xelata Sakharovî, sipasîya xwe ya ji ber dan û standinên aştiyê yê li ser pîrsa Kurd ên di navbera Hikûmeta Tirkîyeyê û serekê Kurd Abdullah Ocalan de dewam dikin diyar dike.

21. Tora Xelata Sakharovî, di dewra qanûnî de herî kêr ji salê carek kombûna Parlemanê û xurtîtkirina girêdayîbûna xwe ya bi mafên mirovî yê cîhanê û şerefa mirovî û di nava endamên xwe de sazîkirina girêdanên xurtir ji xwe re dike armanc.